

**EVERY
CASUALTY
COUNTS**



**PÎVERÊN TOMARKIRINA
QURBANIYAN: KURTENIVÎS**

Naverok

PÎVERÊN TOMARKIRINA QURBANIYAN: KURTENIVÎS	2
RÊSAYÊN TOMARKIRINA QURBANIYAN.....	3
1. Zirarê nekin.....	3
2. Zelalî.....	3
3. Giştîkirin.....	3
4. Domdarî.....	3
5. Berpirsiyarî.....	3
ARMANCÊN BERHEVOKA DANÊYÊN SEREKE JI BO TOMARKERÊN QURBANIYAN	4
PÎVERÊN TOMARKIRINA QURBANIYAN	5
1. Zelaliya Rêxistinî	5
2. Pergala Rêbazan	5
3. Danasîn û Dabeşandin	6
4. Ewlehî	6
5. Weşandina Daneyên Tomarkirina Qurbaniyan	7

PÎVERÊN TOMARKIRINA QURBANIYAN: KURTENIVÎS

Ev belge kurtenivîsekê kurt, hêsan û gihîştbar li ser *Pîverên Tomarkirina Qurbaniyan* e. Ev belge bi tevahî li ser malpera www.everycasualty.org berdest e.

Pîverên Tomarkirina Qurbaniyan ji hêla Tora Tomarkerên Qûrbaniyan ya Hemû Jimarên Qûrbaniyan hatine pêşvexistin ji bo pêşvebirina karekî çêtir, sazkirina lêhevanîne û duristkirina bikaranînekê firehtir ji bo xebata tomarkirina qurbaniyan. Van pîveran nabin ku wekî rêberiya emeliyatî werin bikaranîn. Di şûna wê de van Pîveran armanc dikin ku han bidin tomarkerên qurbaniyan ku aliyên girîng ên bikaranîna baş li ber çavên xwe bigirin û çawa ew dikarin wan li ser projeyên tomarkirina qurbaniyên xwe bikarbînin.

Û herwiha van Pîveran ji bijîşk û kesên ku qurbaniyan tomar dikin re dibin alîkar, ango ew armanc dikin ku daneyên qurbaniyan hêsantir bikar bînin û parve bikin. Ew ji bikarînerên-dawîn ên daneyên qurbaniyan re pîvanên bêalî û pîvanbar peyda dikin ku alîkariya wan ku biryar bidin ka û çawa daneyên qurbaniyan ku ji hêla çavkaniyên cûda ve hatine pêşkêşkirin bikar bînin.

Ji bo berfirehkirina gihîştinê û bikaranîna Pîveran, ev kurtenivîs ji bo tomarkerên qurbaniyên heyî û gengaz li çend zimanên herî bikêr hatiye wergerandin. Ji bo agahî û çavkaniyên bêtir ji kerema xwe bi Every Casualty ('Her Qurbanî ya Cîhanî') re têkevin têkiliyê.

RÊSAYÊN TOMARKIRINA QURBANIYAN

Di navbera pêşxistina Pîveran de pênc rêsayên bingehîn hatin pêkanîn. Hemû pîverên ku li vir hatine pêşkêşkirin ji hêla van rêsayan ve tîr ragihandin û divê ew di seranserê xebata her projeyê de werin parastin.

1. Zîrarê nekin

Dûrxistina zindiyan ji zîrarên din rêsayekê bingehîn e di tomarkirina qurbaniyan de. Ev rêsa ji exlaqên bijîjkî ve hatiye girtin, ku dibe ku ji çar rêsayên ên din girîngtir be. Ew li hemû aliyên tomarkirina qurbaniyan tê bicihanîn, ango ji berhevkirina daneyan bigire heta rêbazên ewlehiyê û weşandina daneyan.

2. Zelalî

Divê tomarkerên qurbaniyan bi qasî ku dikarin di derheqa hemû aliyên van çalakiyan de zelal bin, û bi taybetî di avahîsaziya rêxistinî, awayên xebatê û rêbazên ewlehiyê ji bo karmend, şahid û daneyan de. Zelalî baweriyê bi daneyan pêş ve dibe û dibe alîkar ku bi cih bîne ku ew bi awayekî teqez were şirovekirin. Herwiha zelalî han dide kontrolkirinên kêrhatî.

3. Giştîkirin

Ne pêdivî ye ku tomarkerên qurbaniyan ji hêla siyasî ve bêalî bin, lê divê ew nexebitin ku hemû bûyer û mirinan ku di çarçoveya projeyê de çêdibin tîxin nav xebata xwe, ango divê ew danasînen ku ji bo hemû aliyên wekhev derbas dikin bikar bînin. Divê tomarkerên qurbaniyan bi zelalî diyar bikin kîjan dane, heger hebe, ji tomara xwe derxin û çima. Wek mînak, diyarkirina zehmetiyên behevkirina agahiyan ji civakên ku li dijî ramanên siyasî yan pêwendîya civakî yê tomarkerê qurbaniyan.

4. Domdarî

Domdarî, bi taybetî di rêbazên berhevkirin û pêvajotina daneyê de, ji bo bicihanîna ku tomarên qurbaniyan dibe ku ji bo berhevdanên watedar ên li dem û li cih werin bikaranîn, pir girîng e. Dema ku rêbaz di bersiva rewşên derveyî yê guherok de diguherin divê ew bi baldarî werin dîtin û bi zelalî werin nîşandan da ku kalîteya daneyên ên ragirtî misoger bike.

5. Berpirsiyarî

Divê tomarkerên qurbaniyan bi berpirsiyarî bi hemû kesên ku bandor lê bûne an ên tevî xebata wan in, tev çavkanî û karmendên wan re tevbigerin. Pêdivî ye ku pêkanîna berpirsiyariyê bi zelalî were dîtin da ku bawerîya kesên ku agahiyên xwe yê kesane peyda dikin û bikar tînin pê were.

ARMANCÊN BERHEVOKA DANÉYÊN SEREKE JI BO TOMARKERÊN QURBANIYAN

Tomarkerên qurbaniyan daxwazên xwe di derheqa berhevkirina agahiyan de li gorî armancên taybet ên projeya xwe saz dikin. Lêbelê, bi kêmtirîn divê tomarkerên qurbaniyan hewl bidin ku agahiyên sereke di nav daxwazên de bihêlin. Ew jî:

Armancên berhevoka daneyên sereke	
Cih	Hûrgiliyan tomar bikin, wek mînak navê bajarok an gund an jî heger gengaz be tevahiya hevahengên GPSê.
Rojwext / Dem	Hûrgiliyan tomar bikin tevî rojwext û dem heger pê wan tê zanîn.
Çavkanî	Hemû çavkaniyan tomar bikin wekî raporên nûçeyan, belgeyên fermî, girseya gel, an jî şahidiyên şahidan. Divê çavkaniyên bi piranî bi girêdan bi tomarên qurbaniyan re werin ragirtin. Divê çavkaniyên hestiyar wekî şahidiya şahidan werin parastin.
Hejmara qurbaniyan	Gava ku naskirina agahiyan di derheqa kesên ku di bûyerekê taybet de hatine kuştin de ne berdest be, hejmara qurbaniyan wekî pîvanekê navbirî tomar bikin heta ku hûrguliyên bêtir werin bi dest xistin.
Nav	Navê her qurbaniyekê/î tomar bikin û bi taybetî bi bikaranîna zanîna nêzîk di derheqa navên deverî de. Baş bizanibin ku hûn herwiha dikarin navên cûda yê heman kes heger pêwîst be tomar bikin (wek mînak, bernav an navên ne rast).
Temen	Rojbûna her qurbaniyekê/î an temenê wê/î di dema mirin an windabûnê de tomar bikin. Heger ev agahî ne berdest be tomar bikin ka qurbanî zarok an gihîştî bû û bi taybetî bi bikaranîna pîverên zelal û domdar. Divê şaxên din ên wekî zarokên biçûk, pitik, nûciwan an ên mezintir heger werin bikaranîn bi domdarî werin sepandin.
Regez	Her ku gengaz be regezê her kes tomar bikin.
Hûratiyên mirinê	Dibe ku ev agahî bi awayên cuda were saz kirin, wek mînak bi rêya çek, sedema bijîşkî ya mirinê an jî ravekirinekê di derbarê bûyerê de.
Beşdarên têtetî	Kom û/ an kesên ku hatine ragihandin ku tevî bûyerê bûne tomar bikin tevî partiyên nakokî yê heyî û kom an kesên ku berpirsiyarî girtine ser xwe.

PÎVERÊN TOMARKIRINA QURBANIYAN

1. Zelaliya Rêxistinî

Divê tomarêrên qurbaniyan her dem:

- di derheqa peywir û handerên wan ji bo tomarkinê de zelal bin.
- agahiyên di derheqa pergala rêbazên xwe de zelal û bi eşkereyî gihîştbar bikin.

Divê tomarêrên qurbaniyan hewl bidin ku:

- agahiyan di derbarê pêwendiyên sîyasî an pêwendiyên din de peyda bikin çimkî ew dibe ku îltîzama wan bi tomarkirina tevîker zerer bikin.
- avahisaziya rêxistinî ya rêxistina wan ji hemû aliyan re zelal û gihîştbar bikin.
- agahiyên li ser daneran zelal û bi eşkereyî gihîştbar bikin.

2. Pergala Rêbazan

Divê tomarêrên qurbaniyan her dem:

- alavên zelal li ba wan hebe ku hem bi delîlên belgeyî û hem jî bi daxuyaniyên şahidan re tevbigerin.
- pergalekê hevqirtî û baş-rêxistî ji bo pêveajotina agahiyan li ba wan hebe û di heman demê de cihekî ji hukim û nermîtiya mirovî jî bihêlin.
- bi rêzikî perçeyên taybet ên agahiyan tomar bikin.
- ji bo pejirandin û nixandina daneyên ên berhevkerî pêvajoyekê wan hebe.
- ji bo çareserkirina cudatiyan di navbera çavkaniyan de pergalekê wan hebe.
- awayên wan hebin ji bo xwe ji tomarkirina dubarekirî dûr bixin an jî wê çareser bikin.

Divê tomarêrên qurbaniyan hewl bidin ku:

- ji bo her tomarekirinekê gengaz gelek çavkaniyên serbixwe bikar bînin.
- li hemû çavkaniyên gengaz ên ku li ba wan berdest in û hêz û sînorên xwe miqate bin.
- karanîna pîvanek nixandinê bikar bînin da ku pêbaweriya her çavkaniyê bikin, û ji venêranê re vekirî be.
- tu çavkaniyekê ku dikare agahiyên pêwendîdar peyda bike red neke her çend agahiya peydakirî kêr jî be.
- her belgeyekê têkildar tomar bikin.
- armanc bikin ku daneyên wan bi gelek çavkaniyên serbixwe piştrast bikin.
- rêbazan saz bikin da ku kirina daneyan bi awayekî domdar were piştrastkirin.
- hemû daneyên têketî ji bo sererastkirinê û ji bo zêdekirina agahiyên nû vekirî bihêlin.
- pêvajoya tomarkirina qurbaniyan di navbera mirovên cûda de parve bikin da ku xebat hêsan bikin û şaşiyên mirovî kêr bikin.

- li ber çav bigirin ku endamên karmendê berî pejirandina bûyerekê/kesekê/î daneyên têtetî yên hev binirxînin

3. Danasîn û Dabeşandin

Divê tomarê qurbaniyan her dem:

- pîvanên tevlêbûn û veqetandinê yên zelal ên ku bi eşkereyî tî vegotin deynin.
- danasîn û rêzên ku bi mijar û armanca xwe re liçin in hilbijêrin.
- berî destpêkirina bi înisiyatîva tomarê qurbaniyan komekê seretayî ji xal, beş û danasîna agahiyan diyar bikin û van tiştan di pêvajoya tomarê qurbaniyan xwe de bi hûrî bikar bînin.

Divê tomarê qurbaniyan hewl bidin ku:

- li ba wan vebijarkê hebe ku agahiyan nîşan bikin wekî "nediyar" an "demkî".
- li ber çavê xwe mijarê dabeşkirinê di dema avakirina danegeha xwe de bigirin.
- mirinên kesên nediyar heta asta hûrguliyê tomar bikin, heger gengaz be.
- bişêwirin û/an danegehên kesên windayî berhev bikin da ku bibe alîkar ku qedera kuştîyên nediyar zelal bikin.

4. Ewlehî

Divê tomarê qurbaniyan her dem:

- hay ji hebin ku xeter tî guhertin û xeterên taybet ên ku bi her qonaxê yên çerxa tomarê qurbaniyan ve girêdayî ne destnîşan bikin.
- ji şahidan razîbûna agahdar a ku ji bo hemû armancên agahiyên wan ên ku werin bikaranîn li çih in bistînin.
- bi zelalî tîkiliyên bi hemû karmendan re bi peymanên nivîskî an devkî diyar bikin, dema guncan be pêdivî bi nepenîtî û taybetîyê heye.
- piştî bin ku hemû karmend haya wan ji tedbîrên ewlehiyê yên ku ji bo parastina wan hatine danîn heye û wan tîdigihîjin û qebûl dikin û bi hêsaniyê digihîjin wan.
- ji karmendên xwe re protokolên ewlehiyê pêş ve bixin û peyda bikin, tevî rahênkirinê li gorî hewceyê.
- astekê gihîştina piştîgiriya derûnî ji karmendên wan re misoger bikin.
- li ba wan planekê ji bo tomarê qurbaniyan daneyan hebe berî ku ew dest bi berhevkirina daneyan tevî hukmên paşde bikin.
- hêsab bidin bandorkerên qanûnî, teknolojiyê û mirovî di dema axaftina li ser mijarên ewlehiya daneyan de û di nav de qanûnên parastina daneyan.
- hewcedariyên ewlehiya daneyên xwe bi zelalî diyar bikin gava ew daneyan bi peywirdarên din re parve dikin.
- ji bo gengaziya binpêkirina daneyan plan saz bikin.

- bi tevahî binirxînin ka alavên ku ew bikar tînin armancên ewlehiya daneyên wan digirin an na.

Divê tomarê qurbaniyan hewl bidin ku:

- metirsiyan bi awayekî domdar binirxînin da ku ewlehiya mirovên ku di çalakiyên tomarkirina qurbaniyan de dixebitin were piştrastkirin.
- bi hûratî bibînin ka kîjan metirsî bi cûnê daneyên ku ew berhev dikin ve girêdayî ye.
- tenê agahiyên ku bi wan hewce ne û dikarin lîcîh biparêzin kom bikin.
- hay ji peydekerên alîkariya mirovî û piştgiriya mafên mirovan li devera ku ew lê dixebitin hebe da ku ew bikaribin li gorî hewcedariyê ji bo alîkariyê şahidan bi ber xwe ve rêberî bikin.
- astên cuda yê gihîştina daneyên hestiyar di nav rêxistinê de û li ser bingeha hewca-zanîne peyda bikin.
- gava ku proje bidawî bibe li ser çawaniya arşîvkirina daneyan plansaz bikin.

5. Weşandina Daneyên Tomarkirina Qurbaniyan

Divê tomarê qurbaniyan her dem:

- heger an dema ku agahiyên weşandî bi kêmî hatibin piştrastkirin bi tevahî bînin sediqandin.

Divê tomarê qurbaniyan hewl bidin ku:

- li ser hemû awayên ku çawa daneyên wan bikêr bin, û ji kê re û kengî biryar bidin li ser tiştên ku werin weşandin bifikirin.
- sedemên xwe di heqa neweşandina daneyên taybet destnîşan bikin.
- daneyên weşandî li gorî armancên projeyê berhev bikin lê divê ew herdem armanca sereke ya naskirina her qurbanî li ber çavan bigirin.
- awayên herî bibandor di ragihandina daneyên xwe de binirxînin û nas bikin.
- herdem hewl bidin ku daneyên xwe bi zimanê(n) herêmî yê(n) hêrma ku lê çalakiyên xwe pêk tînin biweşînin.
- bifikirin ku çalakiyên xwe bi yê derve re bidin naskirin da ku cemawerên armanckirî û girîng tevî daneyên xwe bikin.
- bixebitin ku daneyên xwe bi qasî ku gengaz be bi firehî parve bikin da ku ji dubarekirina xebatê dûr bikevin, lê di heman demê de divê ew li gorî her rewşekê asta hûrguliyên ku wê peyda bikin biryar bidin.